„Li Oberhausenê "Kuponên belaş yên werzîşê ji bo xwendewanên sinifa yekemîn".

Ji bo kû zarok bikaribin bi serbestî pêş bikevin, pêdivîya wan bi zarokên din re bi hevra hereket kirinê heye, - wek mînakî di yek komeleyekê werzîşê de, cîhê kû ew li vir tên li nihêrînê û destek kirinê. Werzîşê organîzekirî yê di komeleyê de, ji bo piştgirîya zarokan di pêşkeftina wan ya di warên fîzîkî û derûnî de, şert û mercên herî baş diafirîne û li rex vê yekê hêjayîyên lîstîkî yên wekî rêzgirtinê, dadperwerîyê û ruhê tîmê radigihîne.

Bi kuponê belaş yê werzîşê, hemî zarokên sinifa yekemîn yên li Oberhausenê de, dikarin yek endametîya belaş ya ji bo 6 mehan, di yek komeleyekê werzîşê yê beşdar de, werbigirin, bi şertê kû hîn endametîya wan ya yek komeleyekê, ya li Oberhausenê de, tunebe.

Zarokên kû ji xwe berê de endamê yek komeleyekê ne, dikarin yek endametîya belaş ya ji bo 6 mehan, ji bo yek komeleyekê din ya beşdar bikar bînin.

Kuponê belaş yê werzîşê,

- dê di meha Tebaxê ya 2024`an de, bi rîya dibistanan ji bo hemî xwendewanên sinifa yekemîn,yên li Oberhausenê were belav kirinê.
- yek endametîya belaş ya ji bo 6 mehan, di yek komeleyekê werzîşê yê beşdar, ya li Oberhausenê de, gengaz dike.
- dikare heya 31.12.2024` an li cem komeleyên werzîşê yên kû li vir hatine nivisandinê de, were bikar anînê.

Hûnê di derbarê pêşkeş kirinan de, yek awirekê heyî jî, dikarin li ser malpera înternetê ya SSB (Yekitîya Komeleyên Werzişê yê Bajêr) li Oberhausenê, di binê: www.ssb-oberhausen.de/sportgutscheine de agahdarî bibînin.

Parastina Agahîyan

Di çarçoveya ew projeyê de agahîyên kesane dê werin bi kar anîn û ragihandin. Agahîyên kesane dê sê mehan piştî kû analîz hate kirinê, werin reş kirinê. Hûn dikarin agahiyên din yên di derbarê parastina agahîyan de, di broşûra ji bo vê projeyê de, an jî li ser malpera înternetê de, di binê www.ssb-oberhausen.de/sportgutscheine de agahdarî bibînin.

Heke hûnê bi ragihandina agahîyan ji SSBê (Yekitîya Komeleyên Werzişê yê Bajêr) re razî nebin, kuponê belaş nikare were bikar anînê.

Têkîlî

Stadtsportbund Oberhausen e.V.
Sedanstr. 34, 46045 Oberhausen
www.ssb-oberhausen.de
michel.roth@ssb-oberhausen.de
0208 825 – 3121

Stadt Oberhausen
Kommunales Integrationszentrum
Mülheimer Str. 200, 46045 Oberhausen
deniz.catakli@oberhausen.de
0208 825 – 4457

Stadt Oberhausen
Sportentwicklung, Sportplanung
Sedanstr. 34, 46045 Oberhausen
simon.schauff@oberhausen.de
0208 825 – 2883